Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar :731 02-Reşemî- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Fosfora spî hatiye bikaranîn

## Enstîtûya Lêkolînê ya Wesslîng ya navenda wê li Swîsre, bi belgeyan piştrast kir ku dewleta Tirk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê fosfora spî ya qedexekirî bi kar aniye



Nîqaşên li ser bikaranîna çekên kîmyayî yên qedexekirî ji aliyê dewleta Tirk ve li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dewam dikin. Însiyatîfa Parastina Rojava li Enstîtûya Lêkolînê ya Wesslîngê ya li Swîsre, mijar li laboratûvarê da lêkolînkirin. Di encamê de bi belgeyan eşkere bû ku dewleta Tirk di êrîşên xwe yên dagîrkeriyê de çeka fosfor a spî ya qedexekirî bi kar aniye.

**BI BELGEYAN DIYAR BÛ KU FOSFORA SPÎ HATIYE BIKARANÎN**

EnstîtÛya Lêkolînê ya Wesslîngê, mînakên ji şervanekî QSD'ê yê birîndar li laboratûvarê lêkolîn kir û di encamê de raporek ji 4 rûpelan amade kir. Di encama lêkolînê de li ser armanca raporê wiha hat gotin: "Ji bo ku bê nirxandin ka hêzên çekdar ên Tirk di şerê xwe yê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de çeka kîmyayî (mînak, reaktîfên bi fosfor) bi kar aniye, yan na, nimûneyên ji şervanekî birîndar ê li reaktîfên kîmyewî rast hatî, hat lêkolînkirin."
Di dewama raporê de li ser encama lêkolînê hat wiha gotin, "Di nimûneyê de ya lêkolîn li ser hatî kirin, rêjeyeke bilind a fosforê hat tesbîtkirin ku ji rêjeya fosforê ya normal a li mirovekî pirtir e. Tevî rêjeya bilind a fosforê herwiha tîpê birîndariyê jî (şewata ji ber kîmyayê) nîşan dide ku fosfora spî hatiye bikaranîn."

**DR. MANSOÛRAN: DELÎLÊN ME YÊN EM PÊ ÎQNA BIKIN HENE**

Doktor Abbas Manosûran ê Swêdî ku bi eslê xwe Îranî ye û raya giştî wî ji nêz ve nas dike, ji ANF'ê re axivî. Doktor Mansoûran ku di dema êrîşên dagîrkeriyê de şervan û sîvîlên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê birîndar bûyînn tedawî dikirin, anî ziman ku di êrîşan de fosfora spî û bombeyên ji madeyên kîmyayî hatin bikaranîn.
Doktor Mansoûran diar kir ku ji ber çekên qedexekirî yên ji aliyê dewleta Tirk ve hatîn bikaranîn, gelek sîvîlan jiyana xwe ji dest da, bi sedan bi giranî birîndar bûn û got, "Me nimûneyên ji birîndaran girtîn li labûratûvarên li Ewropa dan lêkolînkirin. Rapora laboratûvara li Swîsre piştrast dike ku di navbera semptoman û bombeyên kîmyayî de korelasyon heye. Dewleta Tirk vê rewşê çiqas red bike jî êdî belgeyên me hene ku em dikarin pê civaka navneteweyî îqna bikin."

**RAPOR RADESTÎ OPCW Û NETEWEYÊN YEKBÛYÎ HAT KIRIN**

Dr. Mansoûran diyar kir ku raporên laboratûvarê yên li ser bikaranîna fosfora spî ya qedexekirî ji aliyê dewleta Tirk ve û rapora Însiyatîfa Parastina Rojava ya ji lêkolînên li herêmê radestî Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî (OPCW) û saziyên pêwendîdar ên Neteweyên Yekbûyî kirine.

**'DIVÊ KIRYAR BÊN DARIZANDIN'**

Dr. Mansoûran da xuyakirin ku dewleta Tirk çekên qedexekirî bi taybetî li Serê Kaniyê û Girê Spî bi kar anîne û got, divê civaka navneteweyî li hemberî vê bêdeng nemîne. Dr. Mansoûran bîr xist ku bikaranîna fosfora spî û bombeyên ji madeyên kîmyayî li dijî sîvîlan binpêkirina hiqûq û qanûnên navneteweyî ye û got, "Di serî de Neteweyên Yekbûyî, Dîwana Edaletê ya Navneteweyî û Dadgeha Ceza ya Navneteweyî divê saziyên pêwendîdar tavilê bikevin nava liv û tevgerê. Divê kiryar li dadgehên navneteweyî bên darizandin."


## Turnuveya futbolê ya dibistanên Hesekê bi dawî bû





Turnuveya futbolê ya dibistanên bajarê Hesekê bi serkeftina Tîma Til Tewîl a seretayî û Deham Bozo ya navîn bi dawî bû.
Komîteya Çalakiyan a Gerînendeya Perwerdeyê ya bajarê Hesekê ji bo xwendinên dibistanên seretayî û navîn ên bajêr turuveyek futbolê da destpêkirin.
Turnuve di destpêka meha Kanûna derbasbûyî de bi beşdarbûna 27 tîmên dibistanên navîn û seretayî yên bajarê Hesekê destpê kir û li Stada Cezîra Xedra dihat lîstin.
Turnveya tîmên dibistanên seretayî bi navê "Şehîd Hevrîn Xelef" hat organîzekirin. Tîma Til Tewîl û Tîma Ridwan Begerî yên seretayî ku gihaştibûn qonaxa dawî li hemberî hev lîstin. Di encamê de tîma Til Tewîl bi 3 nuqteyan li beramberî 0 biser ket.
Ji bo merheleya navîn jî turnve bi navê "Şehîd Fayîz Xelî" hatibû organîzekirin. Tîma Deham Bozo û Tîma Elî Bekir di dawiya turnuveyê de li hemberî hev lîstin. Tîma Deham Boz (3-1) biser ket.
Rêvebera Komîteya Çalakiyan a Gerînendeya Perwerdeyê ya bajarê Hesekê Êva Ebdulkerîm got: "Turnuve bi awayê derxistinê hate organîzekirin, da ku tîmên biser nektin di dawiyê de ji maçê derkevin. Lê di hin mijaran de me ji tîmenê binkeftî yên herî baş hildijbart da ku hejmara tîman temam bikin."
Piştre tîmên serkeftî hatin xelatkirin.

## Ji ber vîrûsa Korona 7 hezar kes di nava kêştiyê de asê man



**Ji ber vîrûsa li Çînê derketî, kêştiya ku 7 hezar rêwî tê de, li peravên Îtalya asê ma.**

Kêştiya bi navê Costa Smeralda, ji ber gumana du bûyerên vîrûsê li peravên Cîvîtavecchîa ya nêzî Romayê hat sekinandin. Hat ragihandin ku di kêştiyê de li gel 6 hezar rêwiyî, tê texmînkirin ku 7 hezar kes hene. Tîmên tenduristiyê li nava keştiyê dest bi lêkolînan kirin. Navenda tenduristiya Cîvîtavecchîayê da xuyakirin ku ji aliyê Wezareta Tenduristiyê ve hatine şiyarkirin û ji bo keştiyê sê doktor şandine.
Ji ber hevjînên hev ên Çînî ku taya wan zêde bûye û dikoxin, tê texmînkirin ku vîrûs be. Her du kes li revîra kêştiyê xistine karantînayê.
Qê nimûneyên hatîn girtin bişînin Nexweşxaneya Spallazanî ya pisporiya di warê nexweşiyên belav dibin a Romayê bê lêkolînkirin.



## Finlandayê Rêveberiya Xweser pêşwazî kir

Şandeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi wezîrê derve yê Finlandayê re hevdîtin kir û gelek mijar girêdayî rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê gotûbêj kirin. *R-2*

## `Dibe ku lihevkirinek dewleta Tirk bi Amerîkayê re hebe'

Şêwirmendê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Enwer El-Mişrif got: "Dewleta Tirk bi rêya binpêkirinên xwe yên domdar hewl dide qada mitîngeriya xwe fireh bike. Dibe ku lihevkirinek di navbera Tirkiye û Amerîkayê de hebe."*R-2*



Şopdara Rastiyê ye
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 731 02-Reşemî- 2020 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Komek welatî vegeriya Rojavayê Kurdistan



Ji xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku koçberî kampa Berdereşê ya li Başûrê Kurdistanê bûbûn, 50 kes vegeriyan warê xwe. *R-6*

## Li Serê Kaniyê 6 jin rastî êrîşa zayendî hatin



***Evîn*** Cuma têkildarî hovîtiya dewleta Tirk ya li Serê Kaniyê ya li hemberî jinan, got, "Ev kiryar ji hişmendî û kiryarên DAIŞ'ê ne cuda ne. Hişmendî û armanca her duyan jî bindes tkirina jinan e." *R-3*

## Serdema yekê ya sala xwendinê li herêma Cizîr û Firatê qediya



***Piştî*** ku 230 hezar û 489 xwendekarên herêmên Cizîrê û 97 hezar û 266 xwendekarên herêma Firatê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ketin ezmûnan, serdema yekê ya sala xwendinê qediya. *R-6*

## Her Xêzek Rengek Berxwedanê Ye



***Tevî*** ku Mîtan mihrîcana hunera şanoyê ye, di nava koşeyên xwe de cureyên hunerê tevan dihewîne. Yek ji hunerên bi Mîtan re tê pêşkêşkirin, pêşengeha wêneyan e. Îsal li Şehbayê jî Mîtan 4 bê pêşangeh derbas nebû. Di roja vekirina Mîtan 4 de, 28 tablo hatin pêşandan. Ji wan tabloyan 17 tabloyên şêwekar Eslan Mamo ku bi awayê darêjtî û xeyal hatine nîgarkirin, hatin pêşandan. *R-7*

# Rojeva Kurdan yekîtî ye


**Helbestvan û zaneyê mezin ê kurd Ehmedê Xanî, hertim bi xewna ku rojekê Kurd bibin yek gazî hêz û eşîrên Kurdan dikir, Xanî wiha dibêje:**
**''Şabûn û diladarê hev bin, miraz û meqsed û yek bin**
**Serdar bibin xwe salar bin, bi dadî dildar ba hev da"**
**Li Rojava bi taybetî li sernaserê Kurdistanê daxwaziya sereke ya gel yekîtiya hêzên kurdî ye. Rojeva yekîtiyê jî mixabin gelek alî bi dudilî û durûtiyeke mezin dixwazin li ser bazarê bikin. Weke Ehmedê Xanî gotiye mirov şîrove bike, eger yekîtiya Kurdan bi dil û bi hêvî be wê encamê bigire; derveyî wê ne guncaw e.**

## Tekane rêya pêkanîna hêviyên gel yekitî ye



***Rewşenbîr*** û siyasetmedarên Kurd bang li tevahî partî û hêzên kurdistanî kir ku ji bo yekitiya kurdî bixebitin û destnîşan kir ku "Tekane rêya pêkanîna hêviyên gelê Kurd û rêgirtina li ber destwerdanên derve, yekitî ye. *R-4*

## 'Girêdana ENKS'ê ya bi dewleta Tirk ve yekîtiya Kurdan asteng dike'



***Rûspiyê*** eşîra Hevêrka ya Kurd Silêman Şeto got: "ENKS yekîtiya Kurdan asteng dike. Ji ber ku bi gelek lihevkirinan girêdayî dewleta Tirk e. Em bang li gelê Kurd dikin ku fişarê li partiyên kurdî bikin da ku li ser maseyekê kom bibin û yekîtiya xwe ava bikin." *R-4*

## Heta Efrîn neyê rizgarkirin em ranawestin

***Du sal*** di ser dagîrkirina Efrînê re derbas dibin. Lê hê êrîşên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî Serê Kaniyê û Girê spî dewam dikin. Ji bo rêzgarkirina bajarên di binê dagîrkeriya Tirkiyê de, gel li ber xwe bide û di nava têkoşînê de ye. *R-5*



# Finlandayê Rêveberiya Xweser pêşwazî kir

**Şandeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi wezîrê derve yê Finlandayê re hevdîtin kir û gelek mijar girêdayî rewşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê gotûbêj kirin.**



Şandeya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji hevserokê Daîrye Têkiliyên Derve Dr. Ebdulkerîm Umer, hevserokê Meclisa Rêveber a herêma Cîzîrê Nezîra Gewriyê, cîgirê hevserokatiya Daîrye Têkiliyên Derve Fener El-Giêt û nûnerên Rêveberiyê Xweser a dewletên Scandinavian Şiyar Elî pêk dihat îro hevdîtin bi Wezîrê Karê Derve yê Finlandayê Becca Haavisto re pêk anî. Hevdîtin li avahiya wezareta derve ya Finlandayê pêk hat.

Di serdanê de mijarên girêdayî rewşa giştî ya Sûriyê û Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi taybet, êrişên artêşa Tirk a dagirker ên li ser herêmê, rewşa koçberan û sûcên li dijî welatiyan li herêmên dagirkirî hatin gotûbêjkirin.

Şandeya Rêveberiya Xweser girîngiya vekişandina Tirkiyê û çeteyên wê ji herêmên dagirkirî, derbasbûna hêzên parasatina aştiya navdewletî yên li herêmên û vegera ewle ya koçberan destnîşan kir.

Her wiha şandeyê behsa projeya Erdogan a guhertina demografî û qirkirina etnîkî li herêmên dagirkrî bi hinceta çareserkirina pirsgirêka koçbran kir û destnîşan kir ku Erdogan projeya xwe ya ne mirovî di bin banê Neteweyên Yekbûyî de û bi desteka dewletên Ewropayê dimeşîne. Endamên şandeyê ji wezîrê derv xwest ku rola xwe di Yekitiya Ewropayê de bi cih bîne û da ku projeya nejadperest a li dijî hemû qanûnên navdewletî were rawestandin.

Şandeya Rêveberiya Xweser bal kişand ser rewşa koçberan û neşandina alîkariyên mirovî, bi taybet piştî biryara Neteweyên Yebûyî ya girtina deriyê sînor ê Til Koçberê û îşaret bi girîngiya ku alîkarî bi rêya rêxistinên xwecihî û rêxistinên NGO derbasî herêmên bibin kirin.

Şandeyê destnîşan kir ku ew bi hêvî ne ku Finlanda rola xwe ya çareseriya siyasî bilîze û ji bo beşdarkirina kurdan û nûnerên Rêveberiya Xweser di prosesa siyasî û komîteya destûrî de bixebite û got, bêyî beşdarkirina nûnerên pêkhateyên Sûriyê ne mumkine çareseriyeke siyasî rasteqîn pêk were.

Di hevdîtinê de mijara girtiyên DAIŞ û malbatên wan ên li herêmên Rêveberiya Xweser hate nîqaşkirin, hate gotin ku divê civaka navdewletî bi rêveberiyê re li ser darizandina çeteyan bibe alîkar. Wezîrê Karê Derve yê Finlandayê nerazîbûnê xwe ji ber gefên Tirkiyê yên li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û got ji saetên destpêkê yên êrişên Tirkiyê wan daxuyaniyên şermezariyê dan û firotina çekdan ji bo Tirkiyê qedexe kirin. Wezîrê Derve yê Finlada got ew li dijî guhertina demografî ne û bi vegera koçberan a li herêmên xwe ne.

Piştî civînê kongreyeke çapemeniyê hate lidarxistin.

## Ciwanên Lubnanê ji welêt derdikevin

Li Lubnanê ku bi mehan e li dijî rêveberiya ne baş û nelirêtiyê berxwedan dewam dike, di nava du mehan de bi sedhezaran ciwan ji welatê xwe derketin.



Li Lubnanê ku şêniyên wê ser 6 milyon mirovî re ye, pirsgirêkên ji ber rêveberiya ne baş a welêt derdikevin, herî zêde bandorê li ciwanan dikin. Li gorî daneyên ji Nîsana 2018'an heta Adara 2019'an, rêjeya bêkariyê ji sedî 11.5 bû. Ev rêje di nava ciwanan de ji sedî 23 ye.

Lêbelê bêkarî jî herî zêde bandorê li wan ciwanan dike ku hîndekariya bilind qedandine. Bêkariya li nava van ciwanan jî ji sedî 37 e.

Ji welat direvin

Li Lubnanê ku ji civatên cuda yên etnîkî û olî pêk tê, pêkanîna hevsengiya siyasî zor û zehmet e û penaberên ji Filistîn û Sûriyê jî diçin wir, pirsgirêkên aboriyê girantir dikin. Penaberên li derveyî kampan ji pêncan yek in.

Lêbelê yek ji sedemên bingehî yên giranbûna pirsgirêkên li welêt, rêveberiya ne baş û nelirêtî ye ku mehên dawî ji ber wê xwepêşandan tên lidarxistin. Ji ber ku 'çîna siyasî ya elît' ya li welêt tevlî karên nelirê bûye, di serî de ciwanên xwenda, ciwanên Lubnanê welêt diterikînin.

**SALA 2019. JI SEDÎ 42 ZÊDE BÛ**

Li gorî lêkolîna saziyeke lêkolînê ya serbixwe ya bi navê "Înformatîon înternatîonal" bi taybetî sala 2019'an jimara mirovên welat terikandîn, di ser ji sedî 40î re ye. Li gorî vê yekê di sala 2018'an de 41 hezar û 766 kesî Lubnan terikand. Di sala 2019'an de bi rêjeya ji sedî 42 ev jimar zêde bû û gihîşt 62 hezar kesî. Piraniya wan jî ciwan in.

## Tîma Ramko 15 hezar mayin li Reqayê bê bandor kirin

Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê di raporteke xwe de diyar kir ku; dagîrkeriya Tirk piştî ku destpêka sala 2019 an dîwarek li gundê Mêremînê li nêzî gundê Cilbirê û pişt re li Kîmarê, zêdetirî 3 km. lê kir, îro jî hewl dide bi dîwaran parçeyên dîtir ji axa Sûriyê dagîr bike.

Tirkiye Çiyayê Gir Ji Efrînê Qut Dike

Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê di rapora xwe de teqez dike ku dewleta dagîrker a Tirk li Kantona Efrînê li aliyê Navçeya Bilbilê bi qasî 300 metreyî di kûrahiya axa Efrînê de xendekan dikole. Hewl dide ji nû ve sînoran xêz bike û li kêleka gundê Bîkê, Elî Kerra û Za irê laperên tsîment datîne. Li gorî çavdêriya rêxistina Mavê Mirovan a Efrînê faşîzma Tirk amadekariyên lêkirina dîwarekî dike ku Çiyayê Gir ê girêdayî Navçeya Bilbilê ji axa Efrînê qut bike.

Li gorî raporta rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, dewleta Tirk a dagîrker kolana xendekan ji zîrweya Çiyayê Gir heya Mezargeha Şêx Hemze ya nêzî gundê Elî Kerra bi mebesta xesibkirina axa Sûriyê didomîne.

Dîwarê Parçekirina Xaka Sûriyê Didomînê

Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê bîr tîne ku dewleta dagîrker a Tirk bi destpêka dagîrkirina Efrînê re, sînorên xwe yên li aliyê gundê Bîkê bi qasî 300 metreyî pêş ve anîne. Li gorî çavdêrên rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê, faşîzma Tirk hewl dide heya 7 KM. û bi kûrahiya 300 metreyî dîwarê parçekirina xaka Sûriyê çêke.

Faşîzm Axa Efrîn Desteser Dike

Rêxistina Mafê Mirovan a Efrînê di raporta xwe de dibêje, kiryar û destdirêjiyên Tirkiyê hemû li pêşberî raya giştî û bêdengiya cîhanê pêk tên. Bi vî awayî dewleta dagîrker a Tirk destê xwe datîne ser bi hezaran darên zeytûnan û yên berhemdar ên şêniyên Efrînê. Her wiha beşeke mezin ji xaka Efrînê ku şûngeh û mezargehên pîroz di navê de ne, desteser dike.

Şêniyên Efrînê jî ji serdana gorên bav û kalan mehrûm dike.

## 'Dibe ku lihevkirinek dewleta Tirk bi Amerîkayê re hebe'

Şêwirmendê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Enwer El-Mişrif got: "Dewleta Tirk bi rêya binpêkirinên xwe yên domdar hewl dide qada mitîngeriya xwe fireh bike. Dibe ku lihevkirinek di navbera Tirkiye û Amerîkayê de hebe."

Di van sê rojên dawîn de artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê êrişên xwe li dijî eniyên Til Temir, Eyn Îsa û Kantona Şehbayê zêde kirin.




Şêwirmendê Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Enwer El-Mişrif girêdayî mijarê got: "Êrişên artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ranewestiyane. Tevî ku Hêzên Sûriya Demokratîk li gorî agirbestê tevgeriya jî dewleta Tirk lihevkirina agirbestê binpê kir. Tirkiye mîna berê di dirêjahiya salên aloziyê de tu lihevkirin, peyman an jî sozek navneteweyî bi cih neanî."

Têkildarî armanca êrişan El-Mişrif got: "Dewleta Tirk hewldide projeya xwe ya qirkirina nejadî û guhertina demografîk li herêmê temam bike. Heta niha dev ji vê polîtîkaya xwe bernedaye. Her wiha hewl dide qada mitîngeriya xwe firehtir bike. Hêzên Sûriya Demokratîk bi Rûsya û rejîma Sûriyê re li ser asta leşkerî lihev kir da ku projeya dewleta Tirk asteng bike. Tirkiyê heta niha bi israr e qada dagirkirinê fireh bike. Hîna hewl dide terora ku hêvî dike li "Herêma Ewle" belav bike. Derfeta hebûna lihevkirinek amerîkî-tirkî yan jî erêkirinek ji hêla DYA`yê hebe ku Tirkiyê qada dagirkirin xwe fireh bike".

El-Mişrif wiha domand: "Dewleta dagirker piştî ku Amerîka ji herêmê vekişiya êriş kir. Dibe ku lihevkirin di navberA her du aliyan de girêdayî Herêma Ewle hebe. Lewra em dibînin êriş berdewam in."

El-Mişrif teqez kir ku kombûna gel li dora Hêzên Sûriya Demokratîk û fermandariya wê, têrê dike ku êriş were şikandin û dê tevahiya projeyên mitîngerî têk bibe.

Di dawiyê de El-Mişrif encamên êrişan bibîr xistin û got: "Berdewamkirina êrişan û daxwaza Tirkiyê ji ku herêmên dîtir dagir bike wê çareseriya siyasî asteng bike. Wê aloziya Sûriyê kurtir bike. Divê cîhan bilebite û helwesta xwe ji binpêkirinên Tirkiyê diyar bike."



# Her Xêzek Rengek Berxwedanê Ye

**Tevî ku Mîtan mihrîcana hunera şanoyê ye, di nava koşeyên xwe de cureyên hunerê tevan dihewîne. Yek ji hunerên bi Mîtan re tê pêşkêşkirin, pêşengeha wêneyan e. Îsal li Şehbayê jî Mîtan 4 bê pêşangeh derbas nebû. Di roja vekirina Mîtan 4 de, 28 tablo hatin pêşandan. Ji wan tabloyan 17 tabloyên şêwekar Eslan Mamo ku bi awayê darêjtî û xeyal hatine nîgarkirin, hatin pêşandan.**

**Idrîs HENAN**



### TABLO VINA GELE ME RAVE DIKIN

Eslan Mamo yek ji şêwekarên Efrînê yê xwedî ezmûn û tecrûbe ye. Her xweza, jiyan û taybetmendiyên Efrînê bi şêwekariya xwe vegotiye. Êşa ji ber êrîşên dagîrkeriyê, berxwedana li hemberî êrîşan, vîn û hêviyên vegerê bi rengên cuda li ser tabloyên şêwekariyê nîgar kirine.

Eslan wiha dibêje: "Mîtan ji bo me çalakî û firsendeke hunerî ye ku tabloyên me tê de tên pêşandan. Ji bo her beşeke Mîtan rengek tevlîbûna me heye. Îsal jî ji bo min Mîtan xwedî taybetmendiya cuda ye. Tabloyên min jî naşibin tabloyên berê. Îsal êşa Efrîniyan zêde ye. Ji ber wê tabloyên me jî tevaya hovîtiya dagîrkeriyê û vîna berxwedanê rave dikin".

### BERXWEDANA DARE LI HEMBERI DAGIRKERIYE YE

Eslan Mamo bi damar û kokên darên zeytûnê gelek bibandor bûye. Ji ber wê jî di tabloyên Eslan de dara zeytûnê gelek rengan digire. Ew dar jî bi rêbazekî zelal û darijtî hatine nîgarkirin. Li hin cihan dar bi rengê sor, li hin cihan jî bi rengên cuda hatine xemilandin. Di hinek tabloyan de jî berxwedana darê li hemberî kokqelandinê gelek zelal û eşkere ye. Di vê derbarê de Eslan Mamo wiha got: "Gelê Efrînê xisletên xwe ji taybetmendiya xwezaya Efrînê wergirtine. Ewqas girêdayî axê ye, êdî rehên wî kûr bûne. Çiqas asta hovîtiyê mezin be, nikare koka gelê Efrînê biqelîne. Ji ber wê tabloyên min hemû bi awayê xeyal hatine çêkirin ku li hinekan Efrîn rûyê keçek bedew e, li hinekan jî dareke birîndar e, lê li ser lingan e. Ti ba nikare wê biqelîne. Her wiha di van tabloyên min de bîranîn û jiyana me ya zarokatiyê hatine xêzkirin".

### HER RENGEK HESTEK EFRÎNÎ YE

Eslan Mamo ku beşdarî tevaya beşên Mîtan bûye, ferq û cudahiya Mîtan 4 ji sê beşên derbasbûyî vedibîje û wiha dewam dike: "Bi Mîtan 4 re bi taybetî piştî dagîrkirina Efrînê û berxwedana efsanewî ya li hemberî dagîrkeriyê, asta têgihîştina gelê Efrînê ji rewşa îro re hestiyartir bûye. Her rengek û her lebateke hunerî hestên Efrîniyan têkildar dike. Ji ber vê jî Mîtan 4 nûnertiya vîna azad a gelê Efrînê dike. Pêşangeh jî teyisandina wê vînê ye. Çawa ku lîstikvan li ser dika şanoyê îradeya berxwedanê vedibêje, tabloyên hunerî jî ku weke daran li ser dîwarên şanogehê daleqandî ne, resenbûna zeytûnê rave dikin".

### BAWERÎ RIZGARÎ YE

Şêwekar û mamosteyê nîgarê Eslan Mamo, di dawiya gotinên xwe de serkeftin ji Mîtan 4 re xwest û baweriya xwe ya rizgarkirina Efrînê bi van gotinan anî ziman: "Beşdarbûna gelê me yê bi zorê koçberî Şehbayê bûyî û nirxandina hunera tê pêşkêşkirin, diyar dikin ku gelê Efrînê gelekî têgihîştî û şareza ye. Dikare bi vîna xwe ya azad a ku xwe dispêre çanda resen a dayîkê welatê xwe rizgar bike. Sekna gelê Efrînê cihê serbilindî û rêzgirtinê ye. Baweriya me ew e ku Efrîn di demeke nêz de rizgar bibe".

### MÎTAN PACEYA HUNERA KURDÎ YE

Ji aliyê din şêwekar û mamosteyê akademîk Henîf Hemo, derbarê lidarxistina Mîtan 4 de ev tişt anî ziman: "Mîtan 4 bi awayekî profesyonel li ser dika Çiyayê Kurmênc tê pêşandan. Ev jî cihê spasî û baweriyê ye". Hemo teqez dike ku Mîtan rê li ber ciwanan vedike ku hestên xwe û xwestekên civakê bi awayên cuda yên şanoyê pêşkêş bikin. Hemo wiha dewam dike: "Ji bo ciwanan Mîtan derfet û firsendeke dîrokî ye. Tevî ku berê şano hebû, lê bi Mîtan re ev cureya hunerê bi awayekî zanistî herikî".

Henîf Hemo di dawiyê de ev xal jî got: "Tiyatro weke maka huneran e ku tabloyek jiyana civakî ye. Mîtan jî tevgereke hunerî ya çandî ya akademîk e ku qetek jiyana gelê Efrînê ye. Taybetmendiya Mîtan 4 jî ew e ku karîbû rastiya êş, azar, dagîrkerî û vîna azadiyê li ser dika şanoyê vebêje. Her wiha Mîtan 4 pencereya hunera Kurdî ya ber bi cîhanbûnê ve ye".

## Di Mihrîcana Mîtan de şanoya `Diqîrim` hat pêşkêşkirin

Koma Tiyatra Sarya ya girêdayî Tevgera Kevana Zêrîn a herêma Cizîrê, şanoya xwe ya `Diqîrim` di Mihrîcana 4. a Mîtan a Şano de li kantona Şehbayê pêşkêş kir.

Bi sedan welatî tev li mihrîcanê bûn û şanoya Diqîrim ya bi nivîsa Daryo Fo û derhênar Sarya Golan temaşe kirin.


Çalakiyên mihrîcanê bi pêşendana berhema leyzokan dest pê kir. Pişt re endamên Koma Tiyatra Sarya şanoya xwe bi navê Diqîrim nişan dan.

Navaroka şanoyê girêdayî jinekê ye ku banga mafên xwe dike. Lê dewlet nahêle jin mafên xwe bi dest bixe û digirin, di girtîgehê de her rengê işkenceya dirûnî lê dikin.

Jina girtî di dawiya şanoyê de dibêje, ezê têkoşîna xwe bidomînim heta mafê xwe bi dest bixim û zordestiya dewletê qebûl nekim.

Paşê girêdayî çalakiyên ku jin ji bo mafên xwe dikin sînevizyonek hat pêşkêşkirin.

Di dawiya şanoyê de welatiyan durişma "Jin jiyan azadî" avêtin.



## Ji bo mexdûrên erdhejê stranan dibêjin

Endamên Dengê Meyman ji bo piştevaniya mexdûrên erdheja Xarpêtê li kuçeyên Wanê stranan dibêjin.

Muzîkjenên Kargeha Dengê Meyman ên li Wanê ji bo hunera alternatîf hatine gel hev ji bo piştevaniya mexdûrên erdheja Xarpêtê li kuçeyan amûrên muzîkê lê didin û stranan dibêjin.



Muzîkjen bi amûrên xwe muzîkê çûn Kuçeya Hunerê ya Wanê û stran gotin. Welatiyan eleqeyek mezin nîşanî muzîkjenan da. Dê heta êvarê stranan bêjin û dê bi pereyên kom bikin ji mexdûrên erdhejê re kelûpelan bikirin. Wê muzîkjen tiştên bikirin bidin Baroya Wanê û ew tevlî alîkariya xwe bibin Xarpêtê.



## Polîtîkayên Rûsya Li Ser Kurdan 7

Sîpan ŞÎNDA

Emê vê hefteyê rêzenivîsa xwe ya derbarê polîtîkayên Rûsya de bidomînin. Dema mirov îro jî li polîtîkayên Rûsya yên derbarê Kurdan de dinêre, ew qirêjiya dîrokî bi awayekî eşkere derdikeve pêş. Rayedarên Rûsya di sala 2018'an de ji aliyekî ve fermandarên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) vedixwendin Moskowa û perû dikirin, ji aliyê din ve jî bi Tirkiyê re di pişt deriyên qufilkirî de civînên planên êrîşên li ser Kurdan dikirin. Rûsya bi salan e Tirkiye bi piştgiriya IŞID û komên din yên radîkal tawanbar dikir. Her wiha ji ber polîtîkayên wê yên derbarê rejîma Sûrî de her tim rexne dikir. Lê belê piştî IŞID li hemberî Kurdan şkest, xeyalên Tirkiye têk çûn. Rejîma Baas jî qederekê rihet bî. Rûsya jî êdî biryar da ku dema planên nû hatiye ku wan bêxe dewrê. Ev plan jî dîsa her li ser Kurdan bûn. Ji bo Rûsya Kurdan di warê polîtîk û leşkerî de bêxe deravê teng, û wan mecbûr bike ku li gorî gotinên Rûsya hereket bikin, rû da Tirkiyê ku êrîşî Efrînê bike. Kurd, li hemberî vê polîtîkaya qirêj ya Rûsya mabûn di nava du avan de. Yan wê Efrîn teslîmî rejîma Baas bikiran, yan ji wê rastî êrîşên Tirkiye bihatan. Piştî Kurdan got em Efrînê teslîmî rejîmê nakin, Rûsya hem riya hewayê li ser Efrînê ji Tirkiyê re vekir, hem leşkerên xwe ji Efrînê kişandin. Bi vê jî rola xwe bi awayekî eşkere diyar kir. Di heman demê de Esed jî iqna kir (yan jî mecbûr kir) ku li hemberî êrîşên neyarê xwe yê mezintir Tirkiye bêdeng bimîne. Ya rast ev ji aliyekê ve bi kêrî Esed jî dihat. Çimkî êrîşa Turkiyê ya ser Kurdan heman demê Kurd li hemberî Esed ji zeîf dikirin. Piştî Tirkiyê êrîşî Efrînê kirî, hêzên Esed tavilê li Helebê êrîşî herêmên QSD'ê kirin. Di nava vê xirûcirê de çapemeniya Rûsya jî bi manşetan dixwest raya giştî bide bawerkirin ku destê wan di nava van êrîşan de nîne. Digotin Rûsya ne deyndarê Kurdan e û berpirsiyarî tavêtin ser Emerîka. Digotin Emerîka çek dan Kurdan, piştgiriya wan kir û li hemberî Tirkiyê sîr dan. Digotin her çenda Rûsya Emerîka şiyar kiribe ji, lê Emerîka guh nedaye wan û ji ber vê jî berpirsyarê vê êrîşê Emerîka ye. Heta di hinek rojnameyên Rûsya de dihat nivîsîn ku ji bo navbera Emerîka-Tirkiyê xerab bibe, divê Rûsya Efrînê bide Tirkiyê û polîtîkayên xwe li ser vî esasî bi rê ve bibe.

Dema aloziya dîplomatîk di navbera Rûsya û Tirkiyê de derketî, di peyamên rayedarên Rûsya yên di çapemeniyê de derdiketin de, her tim dihat gotin, divê li Sûriyê makezagoneke federal bê çêkirin û li gorî vê, teksteke makezagonê amade kirine. Ji ber vê jî hewl didin Esed iqna bikin. Ev gotinên ha gelek caran dinyayê tevê bihîstin. Lê çi dema aloziya dîplomatîk ya di navbera Rûsya-Tirkiyê de ket riya xwe û pirsgirêkên di navbera xwe de hinekî çareser kirin, dîsa polîtîkaya Rûsya ya li ser Kurdan vegera ser "riya" xwe ya asayî. Piştî vê êdî di daxuyaniyên rayedarên Rûsya de ev gotinên ha nehatin bikaranîn. Di Konferansa Soçî de di nava birayerên girîng yên hatîn standin de yek jê xala komîteya makezagonê ya ji 50 kesan bû. Ji ber vê jî welatên garantor Rûsya, Tirkiye û Îran bûn. Van her sê dewletan wê her yekê lîsteyeke ji 50 kesan amade bikira. Komîteya ji 50 kesî jî wê ji nava van 150 kesan bihata bijartin. Lê weke her demê Tirkiye û Îran li Soçî jî li hemberî Kurdan derketin.

# Serdema yekê ya sala xwendinê li herêma Cizîr û Firatê qediya

**Piştî ku 230 hezar û 489 xwendekarên herêmên Cizîrê û 97 hezar û 266 xwendekarên herêma Firatê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ketin ezmûnan, serdema yekê ya sala xwendinê qediya.**

Berî du-sê rojan wendekarên herêmên Cizîr û Firatê yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ezmûnên serdema (werz) yekê ya sala xwendinê ya 2019/2020'an bi dawî kirin.

### HERÊMA CIZÎRÊ

230 hezar û 489 xwendekarên dibistanên seretayî, navî û amadeyi, li hezar û 762 dibistanan di ezmûnan re derbas bûn. Di nava wan de 105 hezar û 635 xwendekar li kantona Qamişlo, 124 hezar û 854 xwendekar li kantona Hesekê.

Piştî êrişên dewleta Tirk a dagîrker ên ser bajarê Serêkaniyê û Girê Spî yên 9`ê Cotmeha 2019`an, heta 15 rojan li seranserê herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê perwerde hat rawestandin. Herwiha ji ber dagîrkirina dewleta Tirk û çeteyên wê ya bajarê Serêkaniyê, 150 dibistanên bajêr ku di wan de 17 hezar û 526 xwendekaran perwerde didît, hatin girtin, 120 dibistanên navçeya Til Temir ku 7 hezar û



633 xwendekaran tê de perwerde didît, herwiha 114 dibistanên Dirbêsiyê ku 9 hezar û 807 xwendekaran wan hebûn û 81 dibistanên navçeya Zirganê ku 842 xwendekaran tê de perwerde didît, ji xizmetê derketin. Dagîrkeriya dewleta Tirk 20 dibistanên Serê Kaniyê û dibistaneke Dêrikê roxandin.

Ji bo ku xwendekarên koçber ên herêmên dagîrkirî ji xwendinê mehrûm nebin, Desteya Xwendin û Perwerdeyê li herêma Cizîrê li kampên koçberan dibistan vekirin. Cîgira Desteya Xwendin û Perwerdeyê Ferîde Îbrahîm li ser mijarê wiha axivî: "Ji bo ku xwendekar ji perwerdeyê mehrûm nemînin, li Kampa Waşokanî dibistan hatin vekirin û xwendekar di wan de li ser 3 beşan perwerdeya xwe dibînin."

### HERÊMA FIRATÊ

Li bajarê Kobanê û gundewarên wê, navçeya Sirîn û Eyn Îsa yên herêma Firatê 97 hezar û 266 xwendekaran ezmûnên xwe qedandin.

Ji ber êrîşên dewleta Tirk ên ser kantona Girê Spî ya girêdayî herêma Firatê, li 281 dibistanan perwerde sekinî. Bi giştî 391 dibistanên kantona Girê Spî ya dagîrkirî û dibistanên li ser xeta sînor ji Eyn Îsayê heta Kobanê, ji ber êrîşên dewleta Tirk ji xizmetê derketin. Hin ji wan dibistanan hatin roxandin, yên din jî zirar gihîştiye wan.

Niha li Kobanê, Sirînê û Eyn Îsa ku di nava sînorê herêma Firatê de ne, li 574 dibistanan 4 hezar û 19 mamoste perwerdeyê didin xwendekaran.

Dihat payîn ku xwendekarên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê 16`ê Çile dest bi ezmûnên xwe bikin. Lê êrîşên dewleta Tirk a dagîrker bandoreke mezin li perwerdeyê kirin. Ji bo ku xwendekar ji perwerdeyê qut nebin, Desteya Xwendin û Perwerdeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi biryarnameyekê 19`ê Çile serdema xwendinê ya yekê heta 30`ê Çile dirêj kir.

Tê payîn ku serdema duduyan a sala xwendinê ya 2019 /2020'an 9`ê Sibatê dest pê bike.

## Ji bo sîstemeke nûjen mamoste perwerdê dibînin

*Dilîn EHMED/Ronahî Qamişlo*








Ji rêveberiya Akademiya Ş. Egîd ya Branşa Kurdî Şîlan Mihemed, li ser armanca vekirina Akademiyê, ji rojnameya me re axivî. Şîlan diyar kir ku armanca wan ji vekirina Akademiyê, guhertina sîstema dibistanan û avakirina rêbazeke nûjen e.

Ji bo guhertina rêbazên perwerdê û sîstema dibistanan, 25`ê Adara 2019an li Qamişlo Akademiya Ş. Egîd ya Branşa Kurdî hat vekirin. Ji bo pêşxistina sîstem û rêbazeke nûjen, ji kantona Qamişlo û Hesekê, li Akademiya Ş. Egîd, her meh komek mamosteyên jin mêr perwerdeyê dibîne. Heta niha pênc koman perwerde dîtiye. Niha jî koma şeşan dest pê kiriye. Jimara mamosteyên tevlî bûyîn 58 e. Ji bo zarokên mamosteyan jî, beşeke taybet heye.

Sîstema akademiyê wiha ye: Ji 8`ê sibê heta 1`ê nîvro li ser branşê, ji 3 heta 6ê êvarê jî li ser pedagojiyê ders tên dayîn.

### PERWEDE JI BO ŞÊWAZÊ TÊGIHÎŞTINÊ YE

Şîlan Mihemed, têkildarî mijarê axaftina xwe wiha domand: "Perwerda li akademiyê tê dayîn, li ser branşên dibistanan e. Armanca me guhertina sîstema dibistanan û perwerdê ye. Em dixwazin di sîstema perwerdê de, têgihîştin hebe ne jiberkirin. Her wiha em di perwerdê de, balê dikişînin ser şêwazê mamosteyan yê dayîna dersan û danûstandina wan bi xwendekaran re. Ji bo naskirin û nirxandina mamosteyan, li akademiyê hem mamosteyên pispor, hem yên di perwerdeyê de, tev dersan amade dikin.

Şîlan Mihemed di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Piştî perwerdeyê her mamoste li gorî asta xwe wê li dibistanên bajarê xwe cih bigire. Di dawiyê de vê dibêjim; ji ber ku xwendekar paşroja civaka me ne, divê em asta perwerdê pêş bixin. Bi hêvî me ku mamosteyên me li ser armanca xwe pirtir bixebitin."

### ARMANCA ME JI PERWERDÊ TÊGIHÎŞTIN E NE JIBERKIRIN E

Mamosteya ji Tirpespiyê tevlî perwerdeyê bûyî Evîn Xelef jî, li ser mijarê wiha axivî: "Wek mamosteyên Tirpespiyê em pênç kes tevlî bûn. Ji bo pêşxistina rêbazê me bi xwendekaran re, em tevlî vê perwerdeyê bûn. Ev demek e me dest bi perwerdeyê kiriye, lê sûda heta niha me jê girtî, hemberî perwerdeya salan e. Li vir em ne fêrî rêbazê tenê dibin, ji bo pêşxistina kar jî em tevlî dersên pedagojiyê dibin. Hêviya min ew e ku, em xwendekarên xwe sal bi sal pêştir bixin û nifşekî biexlaq û jîr bigihînin."

## Ji bo sîstemeke nûjen mamoste perwerdê dibînin



**Ji xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ku koçberî kampa Berdereşê ya li Başûrê Kurdistanê bûbûn, 50 kes vegeriyan warê xwe.**

Ji welatiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên ji ber êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê koçberî Başûrê Kurdistanê bûyîn, 50 kes di deriyê Sêmalka yê di navbera Rojava û Başûrê Kurdistanê de vegeriyan warê xwe.

Rêveberê Têkiliyan ê Deriyê Sêmalka Baz Ehmed diyar kir ku rêveberiya derî roja Duşem û Sêşemê ji bo derbasbûna şêniyên derbasî Başûr bûyîn diyar kir. Derî pêşwaziya 50 kesan kir ku ji kampa Berdereşê ya Başûrê Kurdistanê vegeriyan."

Ehmed da zanîn ku ji destpêka êrîşên dagîrkeriyê yên dewleta Tirk li derdora 5 hezar kes vegeriyan Rojava.



# Li Serê Kaniyê 6 jin rastî êrîşa zayendî hatin

**Evîn Cuma têkildarî hovîtiya dewleta Tirk ya li Serê Kaniyê ya li hemberî jinan, got, "Ev kiryar ji hişmendî û kiryarên DAIŞ'ê ne cuda ne. Hişmendî û armanca her duyan jî bindestkirina jinan e."**

Artêşa Tirk a dagîrker û çeteyên wê, 9`ê Mijdara sala borî êrişî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirin. Ji wê rojê ve êrîşên êrîşên ser sîvîlan nesekinîne. Bi taybetî êrîşa ser zarokan.

Çavkaniyeke taybet ji hundirê bajarê Serê Kaniyê diyar kir ku 30 jin ji aliyê çeteyên artêşa Tirk ve destdirêjî li wan hatiye kirin.

Ji aliyekî din ve Rêxistina Mafên Mirovan a herêma Cizîrê heta niha 6 amûrên êrîşên cinsî, revandin û kuştinê belge kirine.

Girêdayî mijarê endama rêveberiya Rêxistina Mafên Mirovan a herêma Cizîrê Evîn Cuma ev nirxandin kir: "Ji bo ku herêmê ji şêniyên wê yên resen vala bike, dewleta Tirk êrîşî sîvîlan dike. Herwiha êrîşî jinan dike. Dema çeteyên dagîrkeriyê derbasî herêmên dagîrkirî dibin, yekser êrîşî jinan dikin. Mîna ku li Efrîn û herêmên dagirkirî yên din dikin.

Evîn di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Kiryarên Tirkiye bi destê çeteyên xwe dide kirin, weke lîstina bi cenazeyên şervanên YPJ`ê, dixwaze jinan çavtirsandî bike û şêniyên resen ji warên xwe koçber bibin. Herwiha peyama şkandina vîna jinan e.

Rêxistina Mafên Mirovan di rapora xwe ya fermî de 6 amûrên hovîtiya çeteyan ya li ser jinan, 2 bûyerên revandinê, 2 êrîşên cinsî û 2 yên kuştinê belge kirine. Çaranûsa kesên hatî revandin heta niha ne diyar e.

Evînê di dawiyê de wiha got: "Di hevdîtinên me yên bi jinan re, jinan diyar kir ku helwêsta dagîrkeriya Tirk û çeteyên wê ya li hemberî jinan, mîna yên DAIŞ'ê ye."



## Kongra Star sîwana jinan tevan e

*Bêrîvan ÇIYA/Ronahî Hesekê*


Di serî de jina Kurd, Kongra Star, mîrasê jinan tevan e.

Bi salan e jina Kurd li ber xwe dide. Ji Sakîne Cansiz heta Hevrîn Xelef, berdêlên pir mezin dane, lê di têkoşîn û berxwedana xwe de bi şûn ve gav neavêtine û bi biryardarî didomînin.

### ROLA JINÊ DI ŞOREŞA ROJAVA DE GELEK BERBIÇAAV E.

Endama rêveberiya Kongra Star ya Hesekê Rîma Mehmûd, li ser rola jinê wiha axivî: "Ji destpêka şoreşa Rojava ve, li her qadê jinê cihê xwe girtiye û li gorî xweseriya xwe, xwe birêxistin kiriye." Derbarê pergala xebatê de jî Rîma wiha axivî: "Ji gundan heta navçeyan, ji navçeyan heta bajar û herêman, rêxistina xwe ava kirin. Li her cihê xwe birêxistin kirîn, rêveberî ji sê kesan pêk tê û komîteya edaletê, komîteya aborî, komîteya parastinê û komîteya perwerdeyê hatine avakirin. Çi herêmên Kurdan, çi yên Ereban me xwe gihandiye her kesê. Bi taybetî piştî rizgarkirina herêmên Ereban ji destê DAIŞê, jinên Ereb paşroja xwe di nava rêxistina Kongra Star de dibînin."

Endama rêveberiya Kongra Star ya Hesekê Rîma Mehmûd, di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Kongra Star ji bo pêşketina jinan tevan kar û xebatê dike. Em bang li jinan dikin ku di binê vê sîwanê de xwe birêxistin bikin."



## "Berxwedan Jiyan e" dewam dike

*Bêrîvan ÇIYA/Ronahî Hesekê*

Di her şoreşa cihanê de ciwanan pêşengî kiriye. Di şoreşa Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jî, ciwanan pêşengî kir. Di her qada civakê de, ciwanan isbat kir ku şoreş bi wan bi bi ser dikeve. Di her qonaxa şoreşa Rojava de rola ciwanan diyarker bû. Ev rol di nava PYDê de jî tê dîtin.

### JI BO RIZGARKIRINA EFRÎNÊ, PÊNGAV HAT DESTPÊKIRIN

Berdevka Meclisa Ciwanên PYDê, Ahîn Elî, li ser pêngava 2. ji rojnameya me re wiha axivî:



"Ciwanên me bi durişma "Berxwedan Jiyan e" dest bi pêngavê kirin. Ji bo rizgarkirina Efrînê vê pêngavê 1ê Gulana 2018an dest pê kir. Pêngav li tevaya herêman belav bû û şeş mehan dewam kir. Di wê qonaxê de me xebateke birfireh –weke civîn, semîner, platformên azad, belavkirina broşûran, perwerdeya îdeolojî, leşkerî û çandî- kir. Bi saya wê xebatê nêzî 500 ciwanî tevlî nava refên QSDê bûn. Dikarim bêjim, pêngava me bi rengekî gelek serkeftî derbas bû.

### PÊWÎSTIYA ME BI QONAXA 2. HEBÛ

Li ser qonaxa 2. ya pêngava "Berxwedan Jiyan e", Ahîn Elî diyar kir ku pêwîstiya wan bi vê qonaxê hebû û wiha dewam kir: "Piştî êrîşên dewleta Tirk û dagîrkirina Serê Kaniyê û Girê Spî, me pêwîst dît ku em pêngava xwe nû bikin. Lewre dagîrkeriyê û şerê taybet, bandor li ciwanên herêmê kiribû. Li ser vê, ji bo ciwanan perspekfîfek hat derxistin û li gorî wê perspektîfê, bi bernameyeke xurt pêngava qonaxa 2. dest pê kir. Li gorî bernameyê wê her mehê çalakiyên cuda werin lidarxistin. Mîna piştgiriya hêzên leşkerî û çandina daran li seranserê herêma Cizîrê."

Di dawiya nirxandina xwe de, Berdevka meclisa ciwanên PYDê Ahîn Elî wiha got: "Wek ciwanên PYDê me dest bi vê pêngavê kir, lê daxwaziya me ji ciwanan ew e ku tevlî vê pêngavê bibin û lê xwedî derkevin.

## Em xeta berxwedan û têkoşînê mezin bikin'

ŞEHBA - Dewleta Tirk êrîşî gundewarên navçeya Şêrewa û Til Rifetê kir. Di êrîşan de zarokekî jiyana xwe ji dest da. Jinên gundê Aqîbê li dijî êrîşan nerazîbûna xwe anîn ziman û gotin, "Li hemberî êrîşên dewleta Tirk a dagîrker emê heta dawiyê li ber xwe bidin û xeta têkoşîn û berxwedanê mezin bikin."

Dewleta Tirk û çeteyên wê careke din êrîşî gundewarên navçeya Şêrewa ya Efrînê û bajarokê Til Rifetê kirin. Di encamê de zarokê bi navê Nadir Ehmed ê 5 salî yê ji bajarokê Til Rifetê jiyana xwe ji dest da û zarokê bi navê Mihemed Hecî Îsa yê 8 salî jî birîndar bû. Herwiha gelek zirar gihîşt sîvîl û malan. Têkildarî mijarê jinên gundê Aqîbê yê girêdayî navçeya Şêrawa ya Efrînê axivîn û hestên xwe anîn ziman.

### 'DEWLETA TİRK ÊRÎŞÎ MALÊN SÎVÎLAN DİKE'

Zeyneb Mele li ser êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê wiha axivî: "Dewleta Tirk a dagîrker û çeteyên wê êrîşî gundê me kirin û saet ji 6'an heta nivê şevê gund topbaran kirin. Nêzî 4 hezar sîvîlî li gundê Aqîbê dijîn. Armanca Erdogan û çeteyên wî ew e ku em mal û milkên xwe ji wan re bihêlînin. Lê bila Erdogan baş bizane çiqas êrîş bike, emê ewqas li ber xwe bidin. Erdogan çiqas malên me xerab bike jî emê malên xwe ji nû ve çêkin û ti carî em dev ji gund û axa xwe bernadin."

### 'EMÊ XETA BERXWEDANÊ MEZİN BİKİN'

Fatma Cefer jî êrîşên dewleta Tirk şermezar kirin û wiha got: "Careke din Efrîn û Şehba bûn



hedefa êrîşên dewleta Tirk û çeteyên wê û zarokekî jiyana xwe ji dest da. Em van êrîşan şermezar dikin û ti carî ji top û tifingên Erdogan û çeteyên wî natirsin. Erdogan dixwaze em dev ji axa xwe berdin û ji wan re bihêlin, lê bila Erdogan jî baş bizane emê her têkoşîn bikin û cihê dagîr kirî emê bistînin. Heta em bijîn, emê xeta berxwedanê mezin bikin."

## Li Reqayê dewreya yekê ya dirûnê



Rêveberiya Jinan a Herêma Hemrat, berî du hefteyan bi beşdarbûna 20 jinan dewreyeke perwerdeya dirûnê vekir.

Ji bo pêşxistina aboriya jinan, rêveberiya Jinan di vekirina projeyên ji bo jinan de di nava liv û tevgerê de ye.

Projeya yekê ya Rêveberiya Jinan a Herêma Hemrat a rojhilatê bajarê Reqayê, dewreya fêrkirina dirûtinê ye.

Rêveberiyê ev proje li ser daxwaziya jinan vekir. Herwiha makîneyên dirûtinê û pêwîstiyên wê peyda kirin. Kesên perwedeyê didin jinên pisporên dirûtinê ne.

20 jin tev li dewreya perwerdeyê ya dirûtinê bûne. Rojane li Mala Jinan saet ji 07:00 heta 12:00'an perwede tê dayîn. Perwerde li gorî du merheyan tê dîtin; yek fêrkirina birîn û bikaranîna makîneyê, ya din jî pîvan caw û afirandina modêlan e.

Proje ji aliyê 5 endamên Rêveberiya Jinan a Herêma Hemratê ve tê birêvebirin.

Têkildarî vekirina projeyê ji endamên Rêveberiya Jinan a Herêma Hemratê Kewser El-Merzûq, wiha axivî: "Em bi tevaya hêza xwe hewl didin alîkariya jinan bikin û hobiyên wan di projeyên aborî de pêş bixin da bikarin bi xwe debara jiyana xwe bi cih bînin. Di heman demê de armanca me ji vê projeyê afirandina derfetên kar e.

Kewser da zanîn ku perwerde bê pere tê dayîn û wê dewam bike heta jin baş fêr bibin.

Fatima El-Ehmed jî ya tev li perwedeyê bûyî spasiya Rêveberiya Jinan kir û got, Ji bo ku jin bikarin bi vekirina projeyên piçûk ên dirûtinê debara xwe bikin, ev dewre derfetek e.

# Tekane rêya pêkanîna hêviyên gel yekitî ye

**Rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd bang li tevahî partî û hêzên kurdistanî kir ku ji bo yekitiya kurdî bixebitin û destnîşan kir ku “Tekane rêya pêkanîna hêviyên gelê Kurd û rêgirtina li ber destwerdanên derve, yekitî ye.**

Di demekê de ku êriş li dijî gelê Kurd hene, girîngiya yekitiya Kurdan zêdetir derdikeve holê. Di demên dawîn de ji bo pêkanîna yekitiya kurdî gelek hewldan û însiyatîf derketin. Lê heta niha ev hewldan negihîştine encamekê. Ji ber ku hêzên derve dest tê werdidin û hin partî jî li gorî berjewendiyên wan hêzên derve ji yekitiya Kurdan direvin.
Girêdayî mijarê rewşenbîr û siyasetmedarên Kurd nêrînên xwe ji ajansa me re parve kirin û bal kişand ser girîngiya yekitiya kurdî.
Endamê Yekitiya Rewşenbîran Fîdan Mihemed got: “Yekitiya kurdî destkeftiyeke nîştimanî ye û pêwîstiyek e. Her wiha ji bo rawestandina koçberiyê gaveke girîng e. Divê kedeke pratîk were dayîn û Kurd werin birêxistinkirin. Her wiha nakokiyên navxweyî werin çareserkirin da ku rê li ber mudaxeleyên derve ku hebûna kurdî dikin hedef, bi taybet rê li ber projeya Tirkiyê ya li Bakurê Sûriyê were girtin.”
Endamê Yekitiya Rewşenbîran a Efrînê nivîskar Mihemed Welîd bal kişand ser girîngiya avêtina gavên pratîk û got: “Di demekê de ku li ser gelê Kurd êriş, komkujî û hewldanên qirkirinê hene, yekitî pêwîstiyek e da ku rê li ber van êrişan bigire. Gelê me ji bo azadiya xwe bi hezaran şehîd dane, yekitî mîsogeriya parastina destkeftiyên şehîdan e. “
Welîd bang li hemû hêz û aliyên kurdî yên siyasî û rewşenbîran



kir ku mil bi mil bixebitin da ku hêviyên gelê Kurd pêk werin.
Endamê Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Mihemednûr Mihemed sedemên ku yekitiya kurdî asteng dikin bi bîr xistin û got: “Divê partiyên siyasî yên ku xwe spartine dewleta Tirk a faşîst, nas bikin ku dewleta Tirk dijminê herî mezin ê gelê Kurd e û naxwaze yekitiya kurdî çêbe.”
Mihemed bang li partiyên kurdî kir ku siyasetên xwe di ber çavan re derbas bikin û gavên cidî ji bo pêkanîna yekitiyê biavêjin. Mihemed got: “Divê ew alî li encamên siyasetên xwe binêrin û Efrîna dagirkirî mînak bigirin. Divê bi lez gavên pratîk werin avêtin da ku yekitiya kurdî ya dûrî ajandeyên herêmî were avakirin.”

## ‘Girêdana ENKS’ê ya bi dewleta Tirk ve yekîtiya Kurdan asteng dike’



Rûspiyê eşîra Hevêrka ya Kurd Silêman Şeto got: “ENKS yekîtiya Kurdan asteng dike. Ji ber ku bi gelek lihevkirinan girêdayî dewleta Tirk e. Em bang li gelê Kurd dikin ku fişarê li partiyên kurdî bikin da ku li ser maseyekê kom bibin û yekîtiya xwe ava bikin.”
Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê piştgirî da ku însyatîfa Fermandarê Giştî yê QSD’ê Mazlûm Ebdî ku ji bo yekîtiya Kurd dabû destpêkirin.
Rêveberiyê daxuyaniyek da, tê de diyar kir ku partiyên Encumena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) dikarin buroyên xwe vekin û xebatên bêyî astengî dewam bikin. Lê heta niha ENKS’ê bi hincetên cûda ti gav ne avêtiye û yekitiya Kurdî asteng dike.
Têkildarî girîngiya avakirina yekîtiya kurdî rûsiyê eşîra Hevêrka ya Kurd Silêman Şeto ji ANHA’yê re axivî.
Silêman di destpêka axaftina xwe de got: “Wekî tê zanîn ku ENKS’ê girêdayî îtîlafê ye, heta niha ji bo yekitiya kurdî ti biryar nedaye. Lê ya ku em dibînin ENKS’ê ji berê bêtir helwesta xwe guhertiye. Lê hin kesayet yekîtiyê asteng dikin ji ber bi dewleta Tirk ve girêdayî ne.”
Şeto destnîşan kir ku ENKS yekîtiya Kurdî asteng dike û got: “Ji ber ku bi gelek lihevkirinan girêdayî dewleta Tirk ji ber vê yekê nikare dûrî planên Tirkiyê li herêmê bikeve. Biryara çarenûsî ya yekîtiyê di destê gelê Kurd de ye. Divê partiyên kurdî nêrîna gel bi cidî bigirin. Me bi hezaran şehîd û birîndar dane. Heger di mijara yekîtiyê de em bi bin ketin dê karesetek li ser gelê Kurd çêbibe.”
Rûspiyê eşîra Hevêrka di berdewama axaftina xwe de bang li gel û partiyên kurdî kir ku ji planên derve hişyar bin.
Şeto îşaret bi girîngiya yekîtiya Kurd kir û got: “Divê partiyên kurdî nakokiyên xwe bidin aliyekî ji ber ku îro roja yekitiya kurdî ye. Dewletên mezin nexşeya nû ya Sûriyê xêz dikin. Divê em parçeyê serke yên vê nexşeyê bin. Heger Kurd nebin yek mafên xwe bi dest naxin. Însyatîfa fermandarê QSD’ê Mezlûm Ebdî baş e. Ji bilî hin kesayetan gelek partiyan destek dan vê însyatîfê. Lê bi demê re wê van însyatîfan a yekîtiya Kurdî qebûl bikin.”
Rûspiyê eşîra Hevêrka ya Kurd Silêman Şeto bang li gelê Kurd kir ku fişarê li partiyên kurdî bikin da ku li ser maseyekê kom bibin û yekîtiya xwe ava bikin.

## ‘Şerê li Helebê ji bo sivikkirina şerê Idlibê ye’

Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Mihmed Xêr Şêxo got “Şerê li Helebê ji bo sivikkirina şerê li eniyên Idlibê ye.”
Li aliyên bakur û rojavayê Helebê şerekî dijwar di navbera çeteyên artêşa Tirk û hêzên rejîmê de rû dide. Yanî di dema şerê li Idlibê de şer li Helebê jî dest pê kir. Êdî Heleb jî nikare pêşwaziya koçberan bike.
Têkildarî şerê li dijî bejahiya rojavayê Helebê ajansa me hevdîtin bi hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbic û Gundewarên Wê Mihemed Xêr Şêxo re çêkir.
Şêxo got: “Di salên derbasbûyî de hêzên rejîma Sûriyê li bajarê Helebê û derdora wê rûbereke zêde kontrol kir. Komên çete li rojavayê bejahiya Helebê mabûn. Bi topbarana taxên Helebê re komên çete dest bi operasyonên xwe kir, di encamê de sivîl bûn qurbanî. Tirs û xof di nava şêniyên Helebê de çêbû. Êrişên li dijî bajarê Helebê bi êrişên hêzên rejîmê yên li dijî çeteyên El-Nusra û komên çete yên ku li Idlibê bi cih bûne, pêk hatine.”
Şêxo dibîne ku şerê li bajarê Helebê rû dide hewldana kêmkirina şerê li dijî eniya Idlibê ye. Şêxo got: “Piştî dewleta Tirk îdiaya vekişandina piştgiriya komên çeteyan ragihand, komên çete şiyar bûn.”
Şêxo diyar kir ku vekişandina Tirkiyê tirs û gendelî xist nava komên çete û got: “Ji ber vê yekê bi armanca dagirtina valahiyê, dibe ku careke din li Idlibê dest bi operasyonan bike. Di encamê de sivîl dibine



qurbanî.”
Mihemed Xêr Şêxo îşaret bi projeyên dewleta Tirk kir û wiha lê zêde kir: “Geh piştgiriya çeteyan dike û geh jî dev ji wan berdide. Ev jî ji ber destwerdana Tirkiyê ji Sûriyê û ji dagirkirina beşek ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye. Dewleta Tirk bi van kiryaran hewldana çêkirina sînorekî dagirkirî li seranserî sînorê Sûriye-Tirkiyê dike û projeyên Osmanî li herêmê pêk bîne.”

## Dewleta Tirk li Terablusê baregeheke nû çêdike

Dewleta Tirk dan û standinan bi hikumeta El-Wifaq re pêk tîne da ku baregeheke leşkerî ya biçûk li nêzî Terablusê ava bike û derbaskirina çekên Tirkiyê li baregeha Miêtîqayê didome. Li gorî malpera El-Erebiye Net dê baregeha ku Tirkiyê ava dike, berpirsa çalakiyên leşkerî li Lîbyayê be û hêzên Tirkiyê yên taybet û yên deryayî beşdar bibin, her wiha cihê daketina balafiran û hevkariya bi hikumeta El-Wîfaq re ye. Çavkaniyan ji malperê re wiha got: “Hikumeta El-Wîfaq dan û standinan ji bo kirîna balafirên leşkerî û bêpîlot ji Tirkiyê pêk tîne, her wiha 2 balafirên Tirkiyê di 48 seatên dawîn de gihîştin Terablusê û fermandarên hikumeta El-Wifaq û hevkariya bi endamên Îxwanan re pere ji Lîbyayê derbasî Tirkiyê kir.”



Şêwirmendê navneteweyî yê Lîbyayê Xesan Selamê ji Meclisa Ewlehiyê re ragihand ku hikumeta El-Wîfaq bi serkêşiya Fayîz El-Sîrac alîkariyê ji aliyên biyanî digire û îşaret bi Tirkiyê kir.
Her wiha leşkerên biyanî yên ku desteka hikumeta El-Wîfaq dikin, bi hezaran hatin Terablusê û li nuqteyên li nêzî hêzên Lîbyayê belav bûn.
Fermandarên Tirkiyê çavdêriyê li ser derbaskirina çekên giran li Terablusê, odeya çalakiyan, veguhastina leşkerên ji Kenya û Somaliyê, plana şopandina bircên çavdêriyê li Terablusê dikin. Ev yek di demekê de ku serdaneke veşartî ku serokê îstîxbarata Tirkiyê Hakan Fîdan li Terablusê pêk anî, da ku çavdêriya rewşa meydanî bike, pêk hat.



# Heta Efrîn neyê rizgarkirin em ranawestin

**Du sal di ser dagîrkirina Efrînê re derbas dibin. Lê hê êrîşên dewleta Tirk li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi taybetî Serê Kaniyê û Girê spî dewam dikin. Ji bo rêzgarkirina bajarên di binê dagîrkeriya Tirkiyê de, gel li ber xwe bide û di nava têkoşînê de ye.**

**Darîn SILÊ/Ronahî Qamişlo**

Li ser salvegera 2. a dagîrkirina Efrînê, rêvebera Ofîsa Jinê ya Meclisa Sûriyeya Demokratîk Emel Şemdîn, ji rojnameya me re wiha axivî: “Di vê şoreşê de xweserî despêkê li milê Efrînê û Kobanê hat ragihandin. Di nava demê de têkoşîna Kurdan bandora xwe li gelên din jî kir. Bi vê bandorê sala 2015an hem Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) hat avakirin, hem Meclisa Sûriyeya Demokratîk (MSD) Di nava her duyan de jî gelên herêmê cihê xwe girtin. Ji ber wê dewleta Tirk xwest sîstema demokratîk ya li Efrînê hatî avakirin ji holê rake.

### TIRKIYE DIXWAZE ÎMPERETORIYA OSMANÎ VEGERÎNE

Emel yûsif debarê mjarê de ev nirxandin kir: “Efrîn hem bi dîrokîbûn, hem bi erdnîgariya xwe giraniya wê heye. Dagîrkirina wê ji bo Kurdan bû êşeke mezin. Lê hê birin bixwîn, vê carê dewleta Tirk a dagîrker 9ê Cotmehê êrîşî Serê Kaniyê û Girê spî kir. Lê weke Efrînê, di dagîrkirina van her du bajaran de jî cîhan bêdeng ma.” Emel nirxandina xwe wiha domand: “Wek ku tê zanîn di şerê Serê Kaniyê û Girê spî de dagîrkerya Tirk bi çekên qedexekirî êrîş dikir. Çawa ku qîrîna Mihemed li dinyayê deng veda. Hedefa dewleta Tirk ne Kurd tene ne, dixwaze aramiya li herêmê û bihevrejiyana gelan jî, xerab bike.
Rêvebera Ofîsa Jinê ya Meclisa Sûriya Demokratîk Emel Şemdîn, axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Em di wê baweriyê de ne ku emê bigihin mafê xwe. Banga min ji bo hêzên navneteweyî, bi taybetî yên behsa mafên mirovan dikin ew e ku, li hemberî dewleta Tirk helwesteke xurt diyar bikin.

### GEL JI BO HEBÛNA XWE TEKOŞÎN DIKE

Ji bo salvegera dagîrkirina Efrînê, Hevseroka Partiya Demokratîk (PYD) Eyşa Hiso



jî, wiha axivî: “Ji bo tevayiya gelê Kurd, kesên aştîxwaz, bi taybetî gelê Efrînê, ev roj rojeke pir biêş e. Du sal di ser dagîrkirina Efrînê re derbas dibin. Lê hê dewleta Tirk bi hovîtî û terora xwe êrîşî gel dike. Lê em her dem dibêjin, wê Efrîn ti caran di binê dagîrkeriye de nemine. Çimkî gelê me riya azadiyê hilbijartiye û gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tev li Efrînê xwedî derdikevin. Li ser armanca dewleta Tirk jî Eyşa hiso got, her kes dizane ku dewleta Tirk dixwaze împeretoriya xwe vegerîne û Rojhilata Navî tevê



dagîr bike. Lê wê dagîkeriya wê li Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî bi dawî bibe.
Eyşa Hiso axaftina xwe wiha qedand: “Ji bo qedandina vê dagîrkeriyê pêwîsî bi yekîtiyê heye. Banga me ji bo gel û hêzên siyasî ev e.

## Rêveberiya Xweser Kêştiya Xilasiya Ji Qeyranê Ye

Bi mebesta salvegera 6. a damezrandina Rêveberiya Xweser a Demokratîk a Kantona Efrînê, ku 29ê Çileya 2014. Hat ragihandin, Hevserokê Desteya Şaredariya Gel a Herêma Efrînê Fayiq Ehmed ji rojnameya Ronahî re axivî. Ehmed di axaftina xwe de cangoriyên berxwedana Rêveberiya Xweser bîr anîn û wiha got: “Di demekê de ku bayê qeyranê li her dera Sûriyê dixist, Rêveberiya Xweser fena kêştiya xilasiyê hat ragihandin” .

### RÊVEBERİYA XWESER PÊKVEJİYAN E

Hevserokê Şaredariya Gel a Herêma Efrînê Fayiq Ehmed, di dewama nirxandinên xwe de wiha axivî: “Kantona Efrînê di binê sîwana Rêveberiya Xweser de, ji aliyê siyasî, aborî, civakî û parastinê ve birêxistinkirî bû. Li ser hîmên biratiya gelan û pêkvejiyanê, tevna civakî dihat ristin. Ji ber wê Rêveberiya Xweser a Demokratîk ne destkeftiyeke gelê Kurd tene ye, destkeftiya tevahiya pêkhate û şêniyên Sûriyê ye. Di heman demê de kêştiya xilasiya gelên Sûriyê ji bayê qeyranê ye”.

### SAZİYÊN RÊVEBERİYÊ DESTKEFTİYÊN GEL İN

Ehmed di dewama axaftina xwe de ev xal jî anî ziman: “Bi ragihandina Rêveberiya Xweser re, ji ber ku malên gel in, sazî û dezgehên gel hemû ji rûxandin û texrîbatê hatin parastin. Saziyên ku li ser fikra şoven a rejîma Baas dihatin birêvebirin, ji nû ve hatin avakirin û li ser bingeha felsefeya nûjen a Neteweya Demokratîk hatin sazûmankirin. Yek ji van saziyên girîng, Desteya Şaredariya Gel bû. Karê desteyê dabînkirina xizmetgûzariya rojane û pêkanîna projeyên stratejîk ên mîna ceyran, av, endazyarî, qîrkirina riyan û berjewendiyên dapî û tapoyan e”.

### HER KES XWEDÎ ROL BÛ

Ehmed bal kişand ser jiyana hevbeş a li Efînê û wiha got: “Her kes dizane ku rêjeya Kurdan li Efrîn 90% derbas dike. Lê ji ber ku projeya me projeyeke exlaqî û polîtîk e, gel û olên li Efrînê dijîn tev hewandin nava xwe. Her aliyek, çi partiyên siyasî, pêkhate û çi jî olên cuda dibin, hemû jî di Rêveberiya Xweser de bûn xwedî rol û misyon”.

### ARMANC AVAKİRİNA MİROV E

Ehmed îşaret bi rola exlaqî ya Rêveberiya Xweser a Demokratîk kir û ev xal li gotinên xwe zêde kir: “Armanca sereke ya Rêveberiya Xweser, avakirina mirovê birûmet û jiyana azad e. Tevî derfetên kêm, dorpêça rejîma Baas û Tirkiyê, dîsa jî şêniyên Efrînê bi rêveberiya xwe re li ber xwe dan û bi vîna xwe ya azad Rêveberiya Xweser parastin. Civaka Efrînê xwedî hêza rêxistinî ye. Ji ber vê xisletê, li beramberî her hewldana têkbirina jiyanê û kompoyên aliyên cuda, bi ruhekî hevbeş hevgirtina xwe parast. Ji xuleka sifrê dest pê kir. Dibistanên bi zimanê zikmakî vekirin û binkeyên gendeliya Baas'ê rûxandin. Pêşketin û geşedanên ku Rêveberiya Xweser li ser bingeha felsefeya Netewa Demokratîk a rêzdar Ocalan diafirandin, hemû bi pêşengiya jinê bûn. Ew jî ji ber rola jinê ya avaker û pêşxistinê bû. Ji ber wê Efrîn veguherîbû qubletgeha sûriyên ku ji agirê qeyranê direviyan”.

### GELÊ EFRÎNÊ TÊKOŞER E

Hevserokê Desteya Şaredariya Gel Fayiq Ehmed di dawiyê de wiha got: “Gelê Efrînê gelekî têkoşer û xwedî îrade ye. Bi keda xwe rêveberiya xwe ava kir. Ji ber ku Efrîn herêmeke çandiniyê ye, civaka Efrînê jî xwedî sebir û saman e. Çawa ku bi salan xizmeta darên zeytûn, hinar û fêkiyan dike, bi heman hezkirinê jiyana hevbeş ava kir. Bi avakirina Komîn û meclîsan dest pê kir. Pişt re jî, sazî û dezgehên xwe yên Rêveberiya Xweser ava kirin. Ev şiklê jiyana demokratîk bi kêrî rejîmên desthilatdar ên Baas û AKPê nehat. Ji ber wû jî her li firsendekê digeriyan ku vê destkeftiya gelan biherifînin û têk bibin. Li ser van bingehan êrîşên dagîrkeriyê yên 20ê Çileya 2018'an dest pê kirin. Ji ber vê zanînê, gelê me jî ketiye wê ferqê. Çawa ku li Efrînê îro jî li Şehbayê rêxistinbûna xwe diparêze û berxwedana xwe li hemberî dagîrkeriyê didomîne”.

**FENER**



## Bi Rêveberiya Xweser Re Serkeftin Misoger E

**Idrîs HENAN**

Di aloziya Sûriyê ya ku şiklê qeyrana herî kirêt li xwe barkiriye de, herêm û bajar xwedî taybetmendiyên stratejîk in. Kî li kuderê serwer be, taybetmendiya hêza xwe derdikeve. Ji lewra bi salan e hemû hêzên li ser erdê di pêşbirka bidestxistina cografyayê de ne. Di destpêka aloziyê de komên qaşo “muxalîf” rikberiyê, di bin navê rizgarkirina axa Sûriyê û rûxandina keleha rejîma desthilatdar a Baas'ê de, berê xwe dan kiritandina axê. Bi vî awayî jî, taybet bi piştgiriya Tirkiyê, Qatar û hinek welatên dîtir ên Ereb û Ewrûpayê, komên çekdar di demeke kurt de beşek mezin ji teretoriya vî welatî xistin bin kontrola xwe. Lê ji ber ku tu projeyek wan a neteweyî ku bi kêrî hemû heyînên li Sûriyê bike nîn bû, berê xwe dan xizmeta ecîndeyên derve. Ji porjeyên cîhanî û herêmî re bûn amûr û alavên pêkanînê. Bi xisletên faşîzane ên mudexelekeran re bûn yek û li şûna biçimê neteweyî şiklê hovtirîn terora cîhanî li xwe bar kirin. Êdî bi şêweyên çetetiya nola DAIŞ, El Nusra, Ehrar El Şam, Sultan Murad,.... hwd derketin pêş. Di oxira xizmeta şoşbanan de, gelên Sûriyê dan ber kêran û şoran û dest bi hemleya xwînî ya li kêleka rejîma desthilatdar kirin.
Parelelî van hemû ecîndeyên derve, kom û girûpên teror, projeya demokratîk a gelan jî di malzarokatiyê de dixulxulî. Li benda teqînê bû ku pêşengiya gelên Sûriyê yên azadîxwaz bike û rê li ber terorekirina pêkhateyên Sûriyê bigire. Pir dirêj nekir û Rêveberiyên Xweseriya Demokratîk li herêmên Rojava hatin ragihandin. Ango senyala guherîn û veguherîna rasteqîner lêket. Êdî gel û hêzên xwe yên birêveberiyê û parastina cewherî li qadên demokrasiyê li hemberî her cureya êrişan li ber xwe didan. Li ser esasê şoreşa zinhî qonaxên guherîn û veguherînê dest pê kirin. Bi vê zihniyeta xort çepera berxwedanê xortir bû û hêviyên gelên li Sûriyê ji nû ve zindî bûn. Hemû kiryar û têkoşîna sîstemê yên jirêderxistina civakê û kesan vala hatin derxistin. Fikra azad ya xweser derket pêş. Vê yekê jî rê li ber modelên derve yên ferzkirina çareseriyan girt ku tekane hêza çareserker, fikir û ramanên dînamîka gelên resen e.
Dikare pirsgirêk û aloziyên hundirîn bi hişekî qewîm li ser jêdera xwe bête çareserkirin. Carek din îsbat bû ku tu projeyek biyanî nikare li ser vê xakê û qadê mayînda çareseriyan pêk bîne. Ji bilî têkelbûn û marjînalkirinê tu şansekî azadiyê bi van projeyên biyanî re nîne. Ango koletiya nûjen e. Lê bi projeya demokratîk a rêveberiyên xwecihî re şopên heqîqetê ronî dibin û rastiya herêmê ya dîrokî ya bi rêgez têye jiyîn. Bi sepandina rastiyên dîrokî re asta hovîtiya êrişên kujer jî bilindtir dibe. Ji ber vê jî em dibînin li her derê welêt nola gola reqûbeqan lê hatiye. Hemû alî rejîm jî di nav de, li ber niyeta dagirkeriyê û berfirehkirina serweriya cografîk in. Li hemberî hêza demokratîk a gelan jî hem fikir in. Lê nola ku rêzdar Ocalan gotiye; dema ku gelên heyranên azadî û demokrasiyê xwedî li bedena xwe “ziman, cografya, çand” derkevin, bê guman wê serkeftina birûmet jî misoger be.